

Tu bi xêr hatî Pirtûkxaneya Lîsşîlê (Lysekil)



Zanyarî bi zimanê swêdî yê hêsan

Tu bi xêr hatî pirtûkxaneyê Lîsşîlê

Saetên xebatê:

| | |
|------------------------|-------|
| Duşemî heta pêncşemiyê | 10-18 |
| Înî | 10-16 |
| Şemî | 10-14 |

Wergirtina pirtûkan bi emanate belaş e.

Her tişt ji bilî vîdyoyan jibo wergirtina bi emanate belaş in.

Karta Pirtûkxaneyê

Ji bo wergirtina bi emanate tu hewcedarê karta pirtûkxaneyê yî ku piştî raberkirina karta naskirinê dê jibo te were raberkirin.

Çi tişt li pirtûkxaneyê hene?

Pirtûk, Kovar, Pirtûkên bideng, Vîdyo, Kampiyûtêr û hwd.

Pirtûkin bi zimanê te bi xwe.

Hin pirtûk bi zimanê koçberan hene.

Bi zimanê sade

Ji bo zimanhêvosên (kesên ku zimên fêr dibin) seretayî pirtûk her viha pirtûkên bideng û rojnameyên nûçeyan bi zimanê swêdî yê sade hene.

Swêdî hîn bibe

Ferheng û pirtûkên rêzimanê bi zimanên cûrbicûr her viha polên perwerdehiya zimên hene.

Jibo zarokan

Pirtûkin bi zimanê swêdî û zimanê wan bi xwe: Pirtûkên bidîmen, pirtûkên çîrokan, çîrokên efsaneyî, helbestên zarokan û hwd. Her viha CD`yên çîrokan, mûzîk û vîdyo jî hene.

www.lysekil.se

Dikarî ji bo wergirtina zanyariyên zêdetir berê xwe bidî malpera şaredariyê û li ser bijareya pirtûkxaneyê kilîk bikî. Her viha li beşa rênimûniya pirtûkxaneyê dikarî pirtûka ku dixwazî lêbigerî.

Her pirsek ku jibo te çêdibe ji berpirsan bipirse!

Qanûnên wergirtina emanate ji Pirtûkxaneyê Lîsşilê

Emanet

Eger dixwazî pirtûkekê ji pirtûkxaneyê bi riya emanetê werbigirî divê karta te ya pirtûkxaneyê hebe, Kartên pirtûkxaneyê belaş in. Eger temenê te zêdetir ji 15 salî ye divê karta xwe ya naskirinê nîşan bidî. Eger temenê te bin 15 salî ye, tu û dêûbavê te gerek ku formê tijî bikin. Piştî wê dê ji bo te karta endamtiyê were dayîn û tu yê bikarî ku ji pirtûkxaneyê pirtûkan bi riya emanetê werbigirî. Tenê kesên ku li pirtûkxaneyê dixebitin, wê biakrin navê te û tiştê ku te wek emanet wergirtiyem bibînin.

Karta Pirtûkxaneyê

Eger tu karta xwe wenda bikî gerê ji berpîrsên pirtûkxaneyê ragihînî. Ewna karta te betal dikin û êdî dê kes nekare karta te bi kar bîne. Eger karta xwe wenda bikî divê diravê dayîna karta teze bidî. Eger nav an navnîşana xwe biguherî, ji kerema xwe berpîrsên pirtûkxaneyê agah bike.

Dema wergirtina emanetê

Dema wergirtina pirtûkan bi riya emanetê çar hefte ne. Carna dema wergirtina bi emanetê renege kêmtir be. Tu dikarî pirtûkekê du caran bi riya emanetê werbigirî; Meger ku kesek di lista çaverêtiyê da be û wê bixwaze. Eger di dema diyarkirî da tiştê ku te emanet bîriye venegerî pirtûkxaneyê, divê ji ber derengkirina xwe cezayê (Crîmeyê) bidî. Eger hat û pirtûk wenda bûn an ziyar lêketin wê çaxê gerê xercê ristorekirin an cînişînkirina wê jî bidî.

Rêsêrva (Reservation) pirtûkan


Tu dikarî ji bo wergirtina pirtûkekê bikevî listeya çaverêtiyê ku ev kara rêsêrva (Reservation; Xwedankirina bo xwe) pirtûkan tê gotin. Dema ku pirtûk bo pirtûkxaneyê hat vegerandin, em wê bi qasî heftiyekê xwedan dikin. Tu yê bi riya E-Mail an kurtepeyamê werî agahkirin.

Pine Kode

Tu dikarî ji bo karta xwe ya pirtûkxaneyê Pine Kode`eke (Pîn Kode; Sîrr; Nepenî) taybet bibêjî. Bi riya nepeniya xwe dikarî ji riya Net`ê dema emanetiye xwe bibînin, wan dirêj bikî û pirtûkên ku dixwazî ji Kataloga pirtûkxaneyê rêsêrv bikî (Reservation).

Kampiyûtirên Pirtûkxaneyê

Bikaranîna kampiyûtirên pirtûkxaneyê belaş e. Tu gerek pêştir kampiyûtirê rêsêrv bikî. Di dema bikaranîna kampiyûtirên pirtûkxaneyê gerek ku qanûnên pirtûkxaneyê berçav bigirî.



Pirtûkxaneya Lîsîlê (Lysekil)